



Gotar

Di Karesata
Şingalê De..
Rodî Hesen

www.buyerpress.com



buyerpress



buyerpress



buyerpress@gmail.com



00905368908545



Hevpeyvin

Şanogerê Kurd
Fewaz Mehmûd
Diaxve



Wêje

Dikim û Nakim
Têra Te Nakim..
Xwendinek
Rexneyî
Anahîta Şêr

Şengalê ...

Derbas bibe
Dilê te mezin e
Pêl birînê xwe bike
Bingeha te êş e
Serjora te himbêz e
Vegere deriyê Laleşê
Veke
Em hemû Şengalî ne...!





Rodî Hesen

Di Karesata Şingalê De.. Medya Kurdistanî Medya Biyanî Wezîfedar Kir

Serpêhatiya Kurdên Ezîdî yê devara Şingalê li Başûrê Kurdistanê, her Kurdistanîyek li pêrgî ezmûnêke sext û dijwar kir . Siyasetvan , rayeder , rawêşênbl , sazî , partî û hema bêje tevahiya civaka Kurdistanî erdkar kir. Pîrsa lêqewimiyên Şingalê taqîkirin û imtihanêke gelek bi cidî ji Medya Kurdistanî re bû . Medya Kurdistanî bi hemî zimanên pê tê nivîsan û weşankirin û bi paşxane xwe yê cudacûda zûzû bîrwar da ku ew hîna neghiştiye asta lîsemlîhgirtina stûbariyeke wiha giran û mezin .

Lê tevî wê yekê jî, dengê Kurdan bo her deverê hat veguheztin û li herdeverî jî hawara Kurdistanê hat bihiştin . Anîha serpêhatiya Şingalê semavê (Headline) sereke yê rojname û dezgehên medyayî yê herî bî bandor û ezmûndar li seranserê cîhanê ye. Lê ew yek zêdetir ne bi saya medya û rojnamevaniya Kurdî pêk hat. Hêjayî behskirinê ye, rojnamegerên Kurdistanî yê ku ji rojnamegerî û medya biyanî re dixebitin, çî wek karmend anjî wek rojnamegerê serbest

serbest (Freelancer) rolekî berçav lîstin û çihêtiliyên wan xuya ye . Karesata Şingalê qelsî û lawaziyên rojnamegerî û medya Kurdistanî jî hemî aliyên ve da pêş . Mirov dikare bi dehan kêmasî bîne ziman . Ji bilî , çewtî û nepêşeyîyê di veguhestinê de .

Xweş hate eyan ku rojnamegerî û medya Kurdistanî hîna jî medyake bêtir li gorî zihniyeteke partîyî tevdi-gere . Hevdem, ku ciwanên Kurdistanî yê jî hemî partî , aydyoloji , rêbazên siyasî û baweriyên cuda di sengerên şer de tîn dîtin , medyaya Kurdistanî , bi aweyê gelemper , wê rastiye dişewîne û li gorî kêfa xwe û berjewendiya aliye sîponser rastiya bûyeran form dîke . Wate , di encamê de ne tenê qehremanî û dilsoziya wan ciwanên Kurdistanî yê ku ji seranserî xaknîgariya Kurdistanê -her çar parçe - hatine parastina xaka başûrê wêlêt dîkin, wek pêwîst roman nehate ziman , belê mirov ne şaş e ku bêje ew xebata bi meznahî hat biçûkirin . Mirovê şopêner gelek caran tîbînî dîke ku

çawa rojnamegerên TV û radyoyên Kurdistanî xelkê li gorî berjewendiyên teng ên partîyî didin axiftin û çawa jî axiftina kesên ku ne bi dilê wan daxvin rediwêstênin , diqurmiçênin û bidawî dîkin. Ma ji wiha bêmistewayî û trajîdî? Ji bo her şopênerê jî ev tişt diyar e û pêwîstî bi westanêke vehizirînê ya dijwar tune ye . Lewra jî pêwîstî bi destnîşankirina tu nawan ne gerek e .

Ne tenê wiha , belê ta derbasbûna çend rojan bi ser penabirina Êzîdiyên Şingal bo dostê Kurdan yê herîmirî ku Çiya ye , tu vîdiyo û dîmnên wan lêqewimyan nebûn . Bîhane jî ew bû ku dever jî aliye çekdarên dewleta Islâmî (DI)ve kontrolkirî yê gelek xetîrak e! Baş e , dezgehên ragî-handîne yê navdewletî û tenanet Herêmî jî (Erebî wek minak) çawa vî karî (karkirina li deverên nearam û xeternak) di rewşên hevşeweyê reşwa niha ya Şingal , pêk tînin. Herwiha , hewla nişandana bûyeran bi aweyêkî nerast û guherandîkirî berdewam e . Ta niha mirov nizane çawa û kî sivilan bi selameti

digihne Rojavayê Kurdistanê . Bi tenê mirov dibîze ku koridorên aram hatine çêkirin .

Gelek dezgehên Kurdistanî jî , bûyîna hin nûçeyên xwe wek çavkanî di çend rojname , radyo û TV yan de wek belgeya serkeftina xwe nişandan !. Weke , ku ew û xelk jî , nizanin ku bûyer li Kurdistanê diqewime û normala her dezgehê Kurdistanî bibe çavkanî. Belê ji xwe nûçe derbarê girî û xwelixwenegirtina rojnamevanên xwe li hember kareseta mirovî ya ku li Şingalê pêk hat , amade kirin û gelek caran jî ew nûçe dubare kirin . Xweş bextan e ku rojnamevanan jî seranserî cîhanê berê xwe dan Başûrê Kurdistanê bo romalkirina pêşveçûnan dena ji xwe belkî dengê Kurdan bi gelek nîzmahtî gihîştibane cîhanê û cîhan wek niha bi befrîyê agahdarî hûrgilîyên qetîlama Şingal nebûbane. Trajîdî bi vî aweyî bidawî nabe .

"Têbîn: Li ser daxwaza nivîskar ku (tikaya ziman û qalibê zimanî islûbê min e), me gotar weke wê weşandiye .

Nêrînek Rexneyî Di Ramana Kurdî de



Mihemed Şexo

Erdelan û Mûkiryar. Wiha jî mîj de hestê netewî li cem Kurdan hebû, çimkî weke hemî rojhilatnas dibêjin ku mercên gel yan millet di kuran de heye, çî jî aliye ziman û jiyana hevpar ve û çî jî aliye hestên netewî û vîna hevjinê ve, lê mixabin ev millet her tim nikarîbû xwe jî nakokiyên navxweyî aza bike, tim ew xwe bi xwe diketin pêsiira hev ta yekî weke Ehmedê Xanî jî germa hînavên xwe bangex xurt bi tundî li riwê demê xistiye: "Lek pêk ve hem îşe bê tîfaq in, Dayim bi temurd û şîqaq in!"

Ku em hêjî vekolin, dîsan em de bextreşiyek xîzîzîr bibînin, çaxê Iskenderê Meqdonî Evista ku li ser çermê di-wazdeh hezar mangan hatibû nivîsandî şewitandiyê û jî bilî heştê û du hezar peyv pêk ve saxlem nemane!!!!

Xwênerek wê bibîne ji mafê xwe ku awirek tûj ji me bide, gava bibêje: Gelo ma ew bobelatên borî hemî rast in? Yan xapûr, talan û wêranî timî para me ye!!! Ev çî narvîn e yawo!!!! Narvîna Kurdan tim reş e!!!

Piştî pîrsa vî xwênere bextewer, em ê jî diroka niha ku hîna dilme ye çend nimûnan nişan bikin, DEXA yekemîn dema ku PDK û YNK xwîna birakujiyê herikandin ta çîya bi ser dayik û birindaran de giryan. DEXA diwemîn di nav PKK û PDK de bû, dîsan gelek berjewendiyên gelêk tîkên û qemûşka birîne bi destê kurdan rabû. DEXA siyemîn weke ewrekî ye, niha jî ser Kurdistanê ew xwe di-vermitîne, ew dibêje ma gelo kengî wê nîr ji min re li-hevhati be, da ez vê barana reş bi ser vî gelî de berdim, belkî wê carê ew nema êdî rabe, çimkî gelek dijminên Kurdan alî min dîkin û çend dek û xefk li doran û di nav wan de çandane, ew bi xwe mijûl in û hay ji wan rîpan nînin..!

Di vê hevçerxa ku em tê de dijîn, wê teqezê bibe, ka em wek gelê Kurd dizanin ku hestek heye navê wî hestê netewî ye. Em hemî di bin baskên wî hestê de dijîn, ku em vî hestî bi her du awayan, yê şênber û razber, xurt nekin û mifayê jî taqetîkirînin borî wernegrin, de bila ev çîya bi ser me de bi-hêrifin, çimkî ew her tim jî me re astegehine hêja bûn, em jî neyar an diparastin, lê me ew neparastin!!!

Ez bi hêvî me çî kesê wê gotarê bixwîne destê xwe deyne ser bextê xwe û bîza-veke nêzikîyayî de nav milletê me de dest pê bike, çimkî ev stûbariya me hemî-yan e, bîjî ew xewna şêrîn yekîtiya Kurdan û bîmire xwekujî.



Luqman Silêman



Piştî Şingalê çî heye?

Çîma wisa li Şingalê hat? Gelo hêza DAIŞê jî ya pêşmerge bihtir bû û dema pêşmerge çav li wan ketin bi şûnde vekîşyan? Yan çekê wan baştir bûn û karin zora pêşmerge bibin? Yan Derûniya leşkerê DAIŞê baştir bû jî ya pêşmergan jî ber ku kilîta buhiştê di destê wan de bû? Yan pêşmerge weke tiralê Mûsilê li wan hatiye û ne dikarin şer bikin? Yan ew jî bo pêşmergên partîyan bûn û ne yê Kurdistanê bûn û girêdanê wan bi partîyeyî ve bi hêzîr in ji kurdistanê.

Ez bawer im ku hin xalên giring û sereke hene ew sedemê şikestina pêşmergan li Şingalê û hin deverên dî, ew jî li gor dîtina min evin.

1- Piştî bîst û sê sala hîn dezgîheke leşkerî jî bo avakirina leşkerêkî yekalî nehatiya damezrandin.

2- Parvekirina bi rêveberiyê di navbera herdu partîyên sereke de Partî û Yekîti. 3- Rêveberiya li kurdistanê ta niha Partî û Yekîti ye. 4- Dezgîhên Asayîşa li Kurdistanê jî Partî û Yekîti ne. 5- Diziya ku îro li Kurdistanê heye û nebûna demokratîyê rast.

Di bawerîya min de, gerek bû piştî salên notan jî sed-sala borî, hemî komên pêşmergan hatibana herfandî, bîngeha leşkerêkî yekalî û dîrî partîyeyî û siyasetyê û bi şeweyekî şîraw bihata damezrandin, tenê dilsoziya wan ji Kurdistanê re ba û bi rengekî ekadimî ew pêşmerge bihatana perwerdekirin û bi hemî rengan guhdan jî wê dezgehê re hebana, ew leşker jî ne li gor partîyeyî bihatana neqandin, hemî alavên berevaniyê jî wan re bihata pêkanîn û

guhdan li wan û zarok û malbatê wan jî baş bihata kirin. Asayîşeke giştî bi çavdêriya kesine pispor di warê ewlehiyê de hatibana avakirin, ew jî dîrî partîyeyî û siyasetyê ba, tenê jî bo parastin û aramiya Kurdistan û milletê kurdistanê ba.

Avakîma hikûmetekê ne li gor berjewendiyê herdu partîyên mezîna da ku hemî dezgîh neyên hevbeşkirin li gor berjewendiyên partîyan xwe, lê gerek e li gor berjewendîya kurdîyeyî û milletê Kurdistanê û birîna diyardeya dizîyê û dîrxistina hemî dîzan jî dezgîhên hikûmetê.

Gerek hemî dezgîhên li kurdistanê heyi ne girêdayî partîyan bin, bila her partîyeyek jî derveyî dezgîhên hikûmetê karê xwe bike û perê hikûmetê ne li partîyan werin belavkirin. Gerek e ta niha bi sedê kargehên pişesaziye li kurdistanê

hatiba avakirin, ma ne şerm e ku ta bi dew jî îranê jî wan re tê, ew perê ku di bengên Uropî de razandine, ew yê milletê kurd in, gerek e ku niha bîngeheke giran jî kargehên çekan re hatiba danîn û Kurdan xwe bi xwe çek jî xwe re çêkirîbana. Karmendên hikûmetê ne li gor wasîta bîkewin di kar de, gerek e heryek li gor karîne xwe û bê wasîte bîkewe nav karê avakirine.

Ma gelo kes jî Nêçîrvan pêve nîne bibê serokê hikûmetê? Lê diyar e ku wê bîbin weke Libnaniyan serok diwê xiristîyan be û serokek jî Sîne bû û yê perleman jî Şî'e bû.

Heger ku kar li Kurdistanê wisa birêve here, wê rojek were ku millet serî li ber wan rake û doza guherîne li wan bike û ne dîr e ku weke welatên Ereban li me were.



Şanogerê Kurd Fawaz Mehmedî ji Büycerpress re diaxive: Ez ji zaroktiya xwe ve hewceyî şanoyê bûm lê min nizanibû navê wê çi ye. Çaxa derdiketim ser şanoya erebî min digot: Ez mirovekî kurd im, bavê Rêvan im. Karê me bi koma Botan re soz e, evin e, biratî ye, wijdan e ji bo şehîdên vê xaka pak Osman û Şêrvan.

Hevpeyvîn: Hozan Hadî

- Fawaz Mehmedî kî ye? Sipasiya we dikim, bi vê didarê kêfxweş im. Ez Fawaz Mehmedî ji Qamişlo me, di 1956an de bûme, despêk li taxa Qedûrbeg û dibistana Selahedin a seretayî bû, em zarok bûn, me nizanibû şano çî ye, me distirand, dîlan dikir, birayê min Dr.Efî Mehmedî ji hunerê , şewekarî û lîstikvanîyê hez dikir, ez bi xwe re dibirim sinemayê, biçûk bûm lê min pir ji sinema hez kir. Li dibistanê di pola çaran de, mamoste hişt ku ez bi wêrekî nêzîkî şanoyê bim, herwiha mamoste Îsa Xemis û mamoste Ebas û mamostekî min êzîdî hebû û gelek kesên din ez ber bi şanoya dibistanê ve birim. Wîlo min di sala 1970î min despêk kir. Çima Şano?

- Şano canê hunerê ye, te dixê nav malbateke nû di kar de, ez ji zaroktiya xwe ve hewceyî şanoyê bûm lê min nizanibû navê wê çi ye, min zarok dicivandin û min ew amade dikirin ji lîstikvanîyê re. - Gelo Tv dikarî bi rol û karê şanoyê rabe? Çawa av laşê mirovekî ti geş dike, şano wîlo mirovatîyê geş dike, erê Tv navdariyê û pereyan tîne, dikeve her malekê de, lê çiçasi Tv pêşkêş bike ew ê li ber afirandina şanoyê biçûk be. Tv di malan de ye lê gava tu çend kesan tîne hولة şanoyê tu serkeftineke mezin dikî, ez hunermendên drama televizyonî yên Sûrî nas dikim, lê gelek ji wan ji şanoyê hatine Tvê weke Hatim Elf, Eymen Zêdan, Zênatî Qudsiyê û

gelekê din di şanoyê de perwerde bûne. - Di nerîna we de çi pêdivî hene ku kesek bibe lîstikvanê şanoyê? Cihan û jiyana lê dibe şano ye, em mirov lîstikvan in, angû çî yekê li ser zemînê bijî lîstikvan e, her yek bi rola xwe radibe, şano jî hunereke pîroz e, ew depê şanoyê ne kêmî erda camî û kenîşê ye, eger mirov ev nas kir, wê bibe xwedî peyama di jiyana xwe de, ev e pêdiviya karê şanoyê yê ku şanoger radijîyê. Ji bo ku mirovek bibe lîstikvanê şanoyê, divê berî her tiştî heskirin û baweriya wî bi şanoyê hebe, laşê wî karibe raje barê lîstikvanîyê û di rahênan û korsên amadekirinê de cihê xwe li gor karî û heskirina xwe bibîne.

Şanoya bi Kurdî, we çî jê re kir? Wê çaxê nedihîştin Kurmanc, Aşûrî yan Sîryan bi zimanê xwe di şanoyê de kar bikin, em di şanoya Erebî de dixebitîn, lê tim em di wê baweriyê de bûn ko em ne ji aliyekî siyasî yan berpirsyarekî re kar dikin, huner çî cure be, radije nameweke mirovatî jî hemî xelkê re, hunermendê rasteqîn nabêje nameya min tenê ji kurdan, ereban yan aşûr û sîryanan re ye. Ez serê xwe ditewînim ji hevalên xwe re, yê di rewşîna xirab de bi zimanê xwe şano pêşkêş kirin, lê ez jî çaxa derdiketim ser şanoya erebî, xelkê dipirsi ev kî ye? Min digot: Ez mirovekî kurd im, ez Fawaz Mehmedî bavê Rêvan im, navê zarokên min(Rêvan, Îvan, Şevzan û

Roksan) in, ez ji malbateke kurd ji taxa Qedûrbeg li Qamişlo me û ez bi vê serbilind im, seknandina min li ser şanoya erebî bi navê şanoyê bû. - Karê te bi koma Botan re, çawa hat, we çî bi hev re kir? Li navenda hunermendê gewre Mihemed Şêxo, min xortekî delal dît navê wî Welat Dêrik bû, nerînên me wek hev bûn, em li hev hatin ku bi hev re kar bikin. Ji wê kêliyê min ji wê navendê û karmendên wê hez kir, paşê me korseke amedkirina lîstikvanan biçûk û mezîni ji koma Botan re li wir vekir, me wek encama wê korsê, şanoyek bi kurdî pêşkêş kir bi navê (Bira Herîfî), heyber ya nivîskar lawê qada pak Hums mamoste Ferhan Bilbul bû, wî bi erebî di gelek mehrecanên de xelat li ser wergirtin, min vegerand koka wê ya kurdî, îro karê me bi koma Botan re soz e, evin e, biratî ye, wijdan e ji bo şehîdên vê xaka pak Osman û Şêrvan, ez serê xwe li ber wan ditewînim û dibêjim: ez Fawaz Mehmedî, ez ê kenê we,

xwîna we ya pak, bikim ximav, pênuş, nivîs û ziman, ji bo nameya şanoyê bigihe hemî mirovan. - Nerîna we derbarê şanoya Kurdî, li ku ye, bi ku ve diçe? min li karê koma Botan a ku pir hêjayî rêzgirîne ye nerî, têbîna min ku şanoya kurdî ne tev şehîd e, tevî rêzgirîne, lê mijarin din ji hene, nivîskar, muzîkvan, şanoger, şewekar û helbestevan jî şehîd in, ji ber êşa me yek e, di dema ku me nikaribû hestên xwe wek me dixwest derxin, em wê kêliyê şehîd ketin, tiştê ez dixwazim bêjim ez ji wan hin dibim, ew jî ji min hin dibin. - gotinek dawî ji te dixwazin. - Ez soz didim ku ez ê ji nameya xwe ya şanoyê re dilsoz bim, ew nameya biratîya mirovan. Ew kesên kilîtan dikin stuyê xwe de û di wê baweriyê de ne ku ew ê pê deriyê buhiştê vekin, bera zanibin ku dema xwedê hebûn afirand, deriyek tenê jê re hişt, deriyê perwerî û lêborîne, roja ku em ji hev hez bikin, destên me di destên hev de be, wê xwedê ji me razî be, ji ber em ê bigihin kêfxweşiya ku xwedayê me ji me xwestiye.

Imran Yûsif: Wergirtiyê xelata yekemîn ya Mehrecana çiroka Kurdî Rewşa tevgera siyasî ya kurdî bi herdu encûmenên xwe ji sedemên koçberiyê ye.



1-Imran Yûsif wek nivîskar,kî ye? Ez ji nivîsandinê hez dikim,nivîsandin li ba min bêhnvedaneke giyanî ye û serxweşiyêke ramani ye, tucaran plana min ne ew bû ku ez bibim nivîskar, lê her dem gava ku hest û ramanên fişar li min dikirin teqînqa hundirê min di rêya nivîsandinê re derdiket, lewre ji nivîsandinê min corecor in (şano-çirok- yekcaran helbest- gotar)her coreyek ji wan çirokeke wê ye taybet li

ba min heye. 2-Helbesta kurdî ya pêlewaz an kêşesaz (mewzûn) û ya pexşan (serbest) li gorî rexnevanan mercên wê hene ta nav lê bibe helbest? Di nerîna te de mercên çiroka ast bilind çî ne? Wêje bi giştî girêdayî berhemdan û afirandinê ye, heger em pêşveçûna wêjeyê bişopînin, em ê bibînin ku herdem ew merc û pîvanên ku rexnevanan jê re danibûn dihatin şikandin, ev jî ji ber ku rexne dida pey wêjeyê ne li pêşiya wê dimeşiya, lewre jî gelek dibistan û berdozên wêjeyê ji nik rexnevanan hatin binavkirin û her dibistaneke wêjeyî merc û pîvanên wê cuda ne. Ev bi giştî, di warê çiroka ast bilind û mercên wê de, di

nerîna min de her hêmanek ji hêmanên çirokê (mijarbüyer- zimanê bêjeyî- cih û dem-hûnandin- axaftin....) pêwistiyeke wê ya taybet heye di avakirina çirokê de wek karekî yekgirtî. Nivîskar çuqasî karibe van hêmanan di cihê wan de, di hundirê çirokê de bikar bîne ji bo yekgirtina çirokê, çuqasî behremend û têgihîştî be di warê bikaranîna teknîkên nivîsandinê û alavên wê de, ewqasî dikare jî wê ber bi asteke bilind ve bibe. 3-“Koçberî” navnîşana çiroka te ya xelata yekemîn a mehrecana çiroka kurdî wergirt , a ku Y.N.K.S lidar xistibû, di nerîna te de xelkên meyî feqîr ne hatin dehdan bo koçber bibin ,nexasim di

wê nezelalîya rewşa me ya siyasî de û nakokiyên her du encûmenên kurdî ? Koçberiya di her sê salên dawî de li herêmên kurdî bû, ji mezintirîn karîset e di dîroka Rojavayê Kurdistanê de û bandorên wê heta demeke dirêj de biminin. Gelek sedemên wê koçberiyê hebûn, yek ji sedemên sereke rewşa aborî ya aloz û nebûna kar bû ku di encama dorpêçkirina herêmên kurdî de rûda. Ev ligel ne aramî û ne tebatîya li herêmên kurdî, herweha rewşa tevgera siyasî ya kurdî bi herdu encûmenên xwe yê baş guh nedan wê diyardeya metirsîdar, tu çare jê re neditin, tenê bilyabûn bi berjewendiyên xwenî partiyane û nakokiyên xwenî navxweyî ku wê

yekê jî hişt baweriya gel bi vê tevgerê kê m bibê bêhêvî li ba gel zêde bibe, ev jî sedemek ji sedemên koçberiyê bû. 4- Hin dibêjin mehrecana çiroka kurdî ne di wê astê de bû, û gelek çiroknivîsên Kurd ku bi zimanê Erebî dinivîsîn xeyidîn, ji ber mihrecan tenê ji bo çirokên bi zimanê kurdî bûn, Imran çî wê yekê dinirxîne? Bjartina rojêke taybet bi çiroka kurdî û li darxistina mehrecana yekem ya çiroka kurdî li bajarê Qamişlo büyereke dirokî bû di dîroka wêjeya kurdî de û de di paşerojê de gelek bandorên erênî li pêşkêta çiroka kurdî bike. Herweha destpêşiya Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê di wê yekê de wê neyê jîbirkin. Derbarî nixandina min ji mehrecanê re çend têbîni-

yên min hene: 1-Jimara beşdaran ji çiroknivîsên kurdî di wê mehrecanê de pir kê m bû û ne li gor hêviyan bû. 2-Nebûna rexnevanan û xelkên nixandînan û gotûdebêjîna çirokan. 3-Ji alî ragihandina kurdî de mehrecanê mafê xwe nestand. Derbarî gazinên nivîskarên ku bi Erebî dinivîsîn,ez dibînim ku ji navê mehrecanê diyar e ku ew mehrecana çiroka (KURDÎ) ye angû çiroka bi zimanê kurdî hatîye nivîsîn. Di nerîna min de ziman nasnameya wêjeyê ye, dema em bibêjin çiroka Kurdî tê wê wateyê ew çirok bi zimanê Kurdî hatîye nivîsîn, çirokên ku bi zimanekî dîtîr hatine nivîsîn tucar û tucaran wê wateyê nadin Lewre ne ji mafê kesekî ye ku jî wê rastîyê bixeyide yan jî jê bireve. Hevpeyvîn: Xalid Umer

Çiroknivîsê Kurd Salar Elo: Min guman dikir ku wê mehrecana çiroka kurdî di asteke bilindtîre de be



Salar Salih kî ye? Navê min Salar Salih Es'ed e, bi nasnavê (Elo) dihatin naskirin, ew jî navê malbata me ye, derçûyê kolîca Hiçûq zanîngeha Ferat im, bi zimanê Kurdî û Erebî çirok û gotarê dinivîsim, herweha di warê vekolîne de jî dixebî-

tim, du pirtûkên min amade hene ji çapkirinê re, "Qisîle" girûpeke ji kurteçirokên bi zimanê Kurdî ye, "Têlên Rêsayî" girûpeke kurteçirokên bi zimanê Erebî ne, û vekolînek di warê AB ya zimanê kurdî de, û gelek gotar di malper û rojnâme û kovaran de li Başûr û Rojavayê Kurdistanê min belav kirine, digel karê nivîsînê jî, ez di warê mafên mirovan û civaka sivil de çalakvan im, yekem car min kurteçirok bi zimanê Kurdî nivîsiye di sala 2007an de bi sernavê "Rojê" û di kovara Helez de belavbû. Çiroka te ya bi navê "Qisîle" di mehrecana

çirokê de beşdar bû, çiroknivîsên din ku beşdar bûn çî li ba Salar çê kirin? Mixabin, ji ber ez jî nişteciyên Hesekê me, tenê di roja yekem de ez amade bûm, min û M.Imran Yûsif çirokên xwe xwendin û li gor axaftina ku di navbera me û amadebûyan de çêbû, ew pir kêfxweş bûn bi herdu çirokên roja yekem, di rojên din jî de çirokê baş hatin xwendin li gor agahiyên ragihandinê, lê bi tevayî mehrecan ne di wê asta bilind de bû, angû çiroka kurdî pêdiviya xebateke mezin e, nivîskarên çirokê pêdiviyê xurtkirinê ne, nemaze di warê zimanê kurdî de ku lawazîyeke diyar di aliyê ziman de

rûda, digel ku gelek nivîskarên çirokê yê xwedî berhem beşdar nebûn di wê mehrecanê de. Ez komîta amadekar ya mehrecanê jî rexne dikim çimkî çirokek tenê xelat kir, lê gerek bû ku ew sê çirokan xelat kiriba. Hin çavdêrên wêjeya Kurdî dibêjin çiroka kurdî li Rojavayê Kurdistanê tune ye, tenê hin pênuş xwe nêzî çirokê dikin lê ne di wê astê de ne, derbarî wan nerînan Salar çî dibêje? Rast e ku çiroka kurdî ne di wê asta bilind de ye, ya ku em hemû dixawzin, ez bi xwe soseretî bûm ji asta çirokên ku di mehrecana çirokê de beşdar bûn, min bawer dikir ku mehrecanê

di asteke bilindtîre de be, lê çiroka Kurdî li Rojavayê Kurdistanê heye û nişkê nû jî çiroknivîsên kurdî yê behremend nuha di warê çiroka Kurdî de dixebitîn û di salên bê de wê berhemên wan roniyê bibînin û di asteke pir bilind de, lê di mehrecana çirokê ya yekem de ez jî dibêjim ku asta çirokan pir nizim bû û hin ji wan ne çirok bûn. Di nerîna te de giringiya li darxistina mehrecana çiroka kurdî ji hêla Y.N.K.S çî ye, û tu çawa wê mehrecanê dinirxîni? Gavek pir girîng bû ku guhdaneke taybet bo çiroka Kurdî yekemîn car hate

kirin, lê gellek kêmasî rûdan ji wan ku komîta nixandina çirokan ne eşkere bû, me nizanibû ku ew kesên çirokên me dinirxînin çiroknivîs in, kesên pispor in yan endamên yekîtiyê ne , bixwe nediyar e ka bo çî navê wan nehat ragihandin ta piştî bi dawîbûna mehrecanê jî, di birûraya min de çênabe helbestevanek çirokê binirxîne divê komîtên pispor bi vê mebestê bêne avakirin, digel ku navên mezin di çirokê de hatin dûnxistin ji komîta nixdar wek M.Ibrahîm Xelîl û M.Wecîha Ebdilrehman? Hevpeyvîn: Büycer Press

Dawîya Plyalê

Hekîm Ehmed

Hêviya Nuh

-Me hêvî mezin bû ji mezin, rîspî û kalan. Heyhat û hezar ax. Sist bûne rehên şêr û piling, gur û şepalan. Tev bûne malkambax. Kes nîne ji bo gelê kurd bike xebatê. Wek Ristem û lhsan.

Me hêvî ji kesî nema bê xortên welatî. Ew himê welêt in.

yeftî me divê, me rê ew e, em dê biçin her. Yezdan arîkar bit: Serdestî ji bo me ne pir e, em dê bibin, ger cihan bi neyar bit.

* Ji helbesteke Osman Sebrî, bi navnîşana (Hêviya Nuh), Hawar hejmar (57).

Bêguman, gava lehengekî weke apo Osman Sebrî helbestê binivîse, wê ew halbest ne weke yên nivîskarên din be, ji ber ew dikare rewşa gelê xwe bixwîne, û destnîşan bike, pirsgirêk çî ye? Sedem çî ne? Û derman çî ye?

-Me hêvî mezin bû ji mezin rîspî û kalan. Heyhat û hezar ax: Li vir, apo diyardeyê (têkçûna hêviyan) pêşkêş dîke. Helbesta pabend û bi taybetî ya navtêdanê wilo yekser mijara xwe bi awayekî diyar pêşkêş dîke, ji ber ew helbest kalsîk e jî hewlata li dû hev tê de rêz dibin (mezin- rîspî- kal).

-Sist bûne rehên şêr û piling, gur û şepalan. Tev bûne malkambax. Xêzên dirêj dîsan hawwateyan pirdîkin ji bo lihevhatina terazûyê, lê nivîser karîbû bi vê xêzê sedemên têkçûna hêviyan bêje. Ew sistbûna rehan ango lawazî û hêvîbûn li ba kal û mazinan.

Bavê Derwîn

Danehev: Luqman Yûsiv

Roja Xweda Hemê da dinyayê derew pê re kirne heval !. Ji ber ku navê wî bi yê derewîn derket, kurê wî halo jê xwest: Bavo, ji ber çîrokên te yên ne di rê de em nema dikarin serê xwe di nav xelkê de rakin; ji ber vê yekê û ji niha û pê de çî civata tu heriyê, ezê bi te re werim, ji bo cara ku tu di gotinê de germ bûyî (derewa te hate xuyakirin) ez xwe bikixwîn. Bi vî rengî tê bi hişê xwe werî û tê ji gotina xwe (derewa xwe) vegeerî. Êvarî bi şev Hemê kurê xwe da rex xwe û berê xwe da şevbêrka odê. Axê ji hemê xwest ku serpêhatîkê ji yên pê re derbasbûyî ji civatê re bêje. Hemê kete ber salfa xwe û nêçîrê de û halo got: Bi serê we van zilaman, di rojekê ji yên buharê de, min xwe avête ser piştê mehîna xwe, min tajyê xwe bi rex

-Kes nîne ji bo gelê kurd bike xebatê. Wek Ristem û lhsan:

Encam diyar dîke, kesayetiyekek serkêş tune ye, dirêkê jî tîne bîra xwêner wek pivanekê ji kesayetiya pêgrew ku wek Ristem û lhsan be.

-Me ji kesî nema bê xortên welatî. Ew himê welêt in: Rewşenbirekî siyasî mîna Osman Sebrî radigihîne ku hêvî nema ji nivîsê berê heye, himên welêt xort in, bêguman ev bûyereke mezine, nexasim gava em binin bîra xwe ku di wê demê de mezin di civaka xwe de destlatdar bûn, xort ji kêm xwendevan û rewşembir hebûn.

-yeftî me divê, me rê ew e, em dê biçin her. Yezdan arîkar bit:

Ji destpêkê ve û bi taybetî di vê xêzê de (em, me) dubare dibe, ew nîşanê dide ku apo Osman bi wijdanê gelemjî (yê gel û civakê) daxive, lavjîya (yezdan arîkar bit) diyar dîke ku helbestvan daxwaza xwe (yeftî) zehmet dibîne.

-Serdestî ji bo me ne pir e, em dê bibin, ger cihan bi neyar bit:

Di vê xêzê de careyê dide pêşîya me (Serdestî), lê em dihestin ku li vir li hemberî neyar û cihanê nivîser bi hêzîr e ji çaxa ku yeftî ji gel û rîberan dixwest.

-Li dawiyê gelo em dikarin bêjin ku dirêka kurdan xwe vedgerîne, her nîşek xwetêkçûyî dibîne? Yan jî tevî têkçûnan her nîşek ala xebatê dide nîşekî nuh bi hêz û hêvî be?

xwe xist û min berê xwe da nêçîrê. Hin min nêzikayî li çiyê nekîrbû xizalek ji ber min rabû. Min da ser piştê wê, ji dehm de min dît hinekan tîrek avêtine lingê mehîna min û hiştine bi sê lingan!. Min mehîna xwe bi sê lingan ajot û careke dî min serê mehîna xwe berda û ji nûve min da ser piştê xizalê !. Dema kur dît ku bavê wî tê de germ bû û herkesî di civatê de di derwa wî de anîne der, bi dengêkî bilind xwe kuxand hişt ku bavê wî raweste, lê hingî bavê wî tê de germ bûbû awirek ji kurê xwe veda û halo jê re got: Xwe ne kuxêne, ez bi xwedêkim ku ez saxbim ezê mehînê bi zixkişêkê gihênime xezalê !.

Dikim û Nakim

Têra Te Nakim..

Xwendinek

Rexneyî

Anahîta Şêxê



Gelo şoreş û hest çî ji hev re dibêjin di vê demê de? Dema Rojava bi kenê pakrewanan, xewnên şoreşgeran û bi hestên nivîskarên wê vêdike. Rast e li vî welatî tişteke naçe ava, ne ken, ne dîlan, ne xwîn, ne mirîn û ne baran.

Hemû di pêşbirkekê de ne, ev pêşbirka hebûnê herdem berdewam e, ji ber ew der bingeha çîraxê ye, tirêja kenê xweda û xwedwendan e, ev der dergûşa afirandinê ye.

Lewra heger bivexwarîna fîncana çêwe re, hest di kêlika berbangê de vejiya, venecîniqe.

Bi vekirina dîwarê fêsbûkê re ... û ji bîr neke bi oxirkirina pakrewanan re, bi vedana konê penaberan re, di maça dawî de û di piştê ebecdiya Kurdî de, Te nas kir şoreş û hest çî ji hev re dibêjin? Di van kêlikan de dastan û efsaneyan davêjin ber hev ... ta ko hest bafirin û li ber bayê xewnên te dîr dîr bîfirin.

Wisa ... û di vê gengeşê de çîrûskên (Dikim û nakim têra te nakim) ji gîyanê (Ehmed Bavê Alan) vejiyan, piştî qolincên dirêj di hinavê hestên wî de. Lê belê ez ne bawer im tu ji dîl bi van çîrûskan re ne kenî, ne girî, ne fetisî, ne bezî û di dawî de wînda nebî.

Di gelek deverên hestên wî de tê matmayî bimîne, tê ji xwe bipirse: Gelo di kîjan kêlikê de ev dimen hatiye afirandin, ev çî sirûş û sîber in yên ko ew hevok bi hev re hûnandin?... Wek di çîrûska wî ya (Niha) de: (Niha ez hatim bîra xwe).

Hest û reng rengareng in di libên tîzbiya çîrûskên wî de, tu dibînî ko kesê xwe, zer e fort, sor e jîbîrkirin û şîn e barana felsefê. Ji (245) liban ev tîzî pêk tê, her libek bajaran e, her libek pakrewanek e, her libek westanek û sibehek e.

Her wiha dema tu di kolanên hestên wî de dimeşî, tê rawestî, amade bî, bilukimî û li hev bigerî, ev rewş di peyama (pakrewanê te me) de eşkere dibe, di vê peyamê de bi awayekî bêhempa hest hatiye nivîsandin:

(Berî tu min bispêrî axê / nerîna dawî li çavên min binere / ewqas çîrok hene / xwêdana aniya min / westan û zayîna welatê min e).

Çîrûskên hestên wî cûrecûr in, tê pê re bilind bibî, pê re dakevî, mîna gulyên sinbilan li ba dibe, li ber çoga bayê havînê. Ev e, felsefa wî ye, te li ba dîke.

Ji aliyekî din ve (Felsefa wê) wiha dibêja:

(Şevê dinê, min di xew de xew dît / ku tu min di xewna xwe de dibînî / mîna dîzan ez derbasî xewa xwe bûm.. / tenê ji bo te bibînim... / tu nehatibû).

Tê zanîn ko ne herkes dikare li hespê tîpan siwar bibe û ne herkes dikare pişporê maçan be ... Ji nivîsê re mîrxasê wê hene, ji maçan re xanedanên wê hene ... û di qeşengiya rûyê hestên (Ehmed Bavê Alan) de tu vê dihingivîni dema dibêje:

(aram be/ hişmend be/ li gel ciwantiyên û dirêjtîrîn maç/ ko bejîna xwe bighîne 45 deqan).

Ne diyar e, çawa di deverîna de xwedî hêz û pêşketin e? û di deverîna din de gundî û tirsonek e?

Ev tişt paçak ji wî ye, normal e xwe bera nav çîrûskên wî bidin, wek ko diyar dibe di (Ez dizanim) de:

(Bi hevalê min re peyamek devkî şandîye / bêbavo xwîşêrîn e / ez dizanim).

Di heman demê de Bavê Alan dengêkî dixwe navbera rewşa kurdî û rewşa xwe ya heylî de, dema bi çavekî siyasî, konevanî rewşa xwe dinixîne, di (hevpeyman) de: (Çawa şandên kurdî di lozan û siver de û niha di cinêv (1-2) de / ji kurdan re tişt ne kirin/ min jî di dîdara te de tişteke qezenc ne kir).

Tu pirtûk, diwan, roman û nivîs tune ko nabe cihê rexin û nixandîne, normal e ko nivîsa me jî bibe cihê rexne, lê tenê mebest jî vî nivîsê danasîn e bi çîrûskên (dikim nakim têra te nakim), kêr zêde hemû dezgeh di rûyê we de vekirîne.

Tu Çûyî



Çimen Mûrad

Eva tu çûyî, bê deng tu çûyî, qey te dizanî tu yê ji vê cîhanê bar biki, û ew kenê li ser lêvên te, wê dîlana xemalî li pey xwe bihêle, û rûhên dîlsoz, wê nobetê li şeva te ya dawî bikin, wê wek mîmên veketî, şiyar û bêhedan bimînin, ew çîrandina min di deqa dawî de, di çavê te de dîtî, îro bi hezarên gotina xatir ji min xwest, serpêhatiyên xweş û yên nexweş, wekî barana biharê ser min de barand, û pîrsên bêbersiv di serê min de honand, gelo gotinek mabû, ya te hê ji min re ne gotî? gelo birnek mabû, bê derman mayî? gelo di jiyaneke di de, wê hebê ez te dîsa bibînim? gelo ev agirê min niha bi saxî dişewitîne, wê rojekê vemire? ax eva tu çûyî, bê deng tu çûyî.


15 Wêneyên Helbestî

Ebbas Kiyarustemî

Ji Erebî: Qadir Egîd

- 1- Xêzkeke sor li ser spîbûna berfê ye, nêçîreke birîndar dikule.
- 2- Di destpêka rohilatê de ciwanîke spî ji mehinêke reş jîdayik bû.
- 3- Wê bahoz gulên gilyazan bi xwe re bibe spîbûna ewran.
- 4- Li paş her pêleke bilind sê pêlên kin in, li paş her sê pêlên kin pêleke bilind e.
- 5- Min heyy verêxist ta di hundirê ewrekî tarî de wînda bû, min mey noşî û raketim.
- 6- Di destpêka rohilatê de heyy bêmad dibe, bi banga keleşêr re stêrê jinav dibe.
- 7- Dema tariyê xwe veda, ba bi bêhna gula şevê tije bû.
- 8- Ta bilind e wî nas nekin, di nivê şevê de balindeyek distrê.

Min...



Mehmûd Badlî

Min kevalek riswa wek şewata bendewarekî tenê bi te mijûl di pêjna dilê xwe de bixwîne. Min sîperêkî boz wek şervanekî çiyayî tenê bi azadiyê mijûl di talda maçên xwe de binivîne. Min sura bayekî wek destê dayikekê tenê bi zîziyê mijûl di xwêdana destê xwe de vîxîne. Min alek rengîn wek arezûya mîletekî bindest tenê bi serxwebûnê mijûl di gîyanê xwe de binexşîne. Min hêlinek germ wek çavên du evindarên şeyda tenê bi evîne mijûl li ser şaxên jiyaneê biçirîsîne. Min gernijandinek guneh wek dergûşeke çelîni tenê bi xwe mijûl li ser sînga xwe bilorîne. Min asoyeke bê alî wek xewna rêwiyeke tenê bi hêviyê mijûl li keskahiya navika xwe biçîrîne. Min êşa penaberekî wek aramiya darek tena tenê bi xwendina şopên rêbîwaran mijûl bi guhê gumana xwe ve daliqîne.



Berhemên Şîr

Dr.Şiyar Silêman

Pêşniyarek :

Şîr herikinek bi nîrx e ,mîrov ji sewalên mē didoşe,ji demên kevn de ,şîr di jiyana mirovan de xwarinek bîngehîn e , ji ber zengînbûna şîr bi hemû pêwîstiyên tenduristî û hêza laş. Şîr bêstir ji 100 hêmanên pêwîst ji laş re , di nav ava xwe de hidilgire ,ji wan hêmanan 25 core ji rûn, 4 coreyên şekir ,30 core ji pirotin û bêtir ji 25 core ji vîtamînan in. Kurdan wek hemî mîletên cihanê girîngiya şîr nasîkirine ,gelek xwarin jê afirandine, em dixvazin di vê kurtgotarê de hin jêpêkhat û berhemên şîr li nik koçerên kurdan bidin nasîn. berhemên ku em wan şîrovebikin evin :**mast, çeqil-mast ,dew, çortan ,lorik, jajî ,penîr ,gîvî ,gulmast,fîro, penîrok ,nîvişk ,rûn** û gelek xwarinên din jî hene , ku berhemên şîr beşek girîng in ji wan .

Emê hewl bidin ku em bi şeweyekî zanistî bi zimanekekî hêsan wan berheman şîrove bikin Dema sewala mē dizê em penîrokê çêdikin .

1- penîrok çîye?Di 3 rojên pêşî ji zana sewalan , şîrê wan nameya , û dema tê kelandin diquse , û rengê wî bi zere ve ye , hinekî hişkûbûn pê re heye , ew şîrê bi van salixan piştî kelandinê,navê wî penîrok e

2- Fîro çîye? Fîro ewe Şîrê piştî 3 rojan ji zana sewal rengê zer jê diçe,nameye , bi kelandinê diquse , hinekî ji şîr şêrîntir e,xwarinek bi tena xwe tê xwarin , û dikeve çêkirina gelek çoreyên şêranî de.

3-Penîr :Penîr berhemekî girînge ji şîr re , ji ber mîrov dikare vî berhemî hillîne .û di zivistanan de , dema nebûna sewalên zayî derxe, Penîr ji şîrê xav çêdibe , bê kelandin ,piştî dotina şîr û hin tîna laşê sewalê tê de heye , an jî ku sar bû hinekî têtê germkirin ta dighê 35-40° c , evî şîrê germ firşik dikin,firşik bi xwe enzîme navê wî ye zanistî rînine evî enzîmî ji şilavka sewalên şîrmij derdixin,lê di dema îrode ew firşik toze li dikanan tê firotin,piştî şîr firşik dibe pirotinê bi navê kazaîn hev digre di nav ava şîrde dema ew pirotinê hevgtirî û av di navheve de be navê wê avê dîkin gîvî , car caran kebanya malê çemçîka xwe di nav wê avê dadike , rûdike sênîka zarokan de , bela zarokan ji xwe vedike ,û zarok birçîbûna xwe pê dişkinin ,

Gîvî bi çarîkê parzûn dîkin , penîr di nav çarîkê de dimîne û ava penîr bi ser dikeve

Hemî berhemên şîrê xav , divê bîn kelindin ji ber şîrê xav carna mikrob tê de hene , nemaze mikrobê Brosêlla yê ku nexweşya taya Malta bi insan û lawiran re çê dîke

4-Lorik:Ava penîr ya piştî parzûnê pirotinî giring tê de hene, wek (globîn) û (albumin), ew pirotin bi firşik hev nagire lê bi tîna germê û kelandinê hev digre û biser avê dikeve ,ew pirtûk parzûn dibin û lorik bi ser parzûnê dikeve û av dimîne

5-Jajî :Jajî jî wek lorikê ye ,lê ava ku jajî jê çê dibe ne ava penîr tenê ye ,ew ava penîr û dew tevhev e , piştî kelandinê pirtîkin zer bi ser wê avê dikevin, ew pirtîk parzûn dibin û jajî di çarîkê de dimîne.

6- Mast :Çêkirina mast bi meyndina şîrê , piştî kelandinê şîrê nû û xav ta bighê germa kelandinê ,ew rûnê bi ser ava şîr dikeve rûnê şîr e ji ber ku rûn ji hemî pêkhatên şîr sivik- tire , bi ser rûyê şîr dikeve ew rûn piştî li ser riwê şîr bi sarbûnê hev digre dibe tûk(qeymax), ew qeymax zengine bi protîn vîtamînan wek A,K,E û D.. piştî sarkirina wî şîrê kelandî ta radeya 40-45° c heyvan li nav şîr dixin,ew heyvan bi xwe mast e mikrobên mast yê bi sûde têde hene ,bi tevîkirina heyvan û nuximandina şîr nêzî 2-3 katjimêran ,ew şîrê te meyndin ,navê meyndinê bi xwe ji navê meyê hatiye ,ji ber şekirê şîr bi enzîmên mikrobên mast tîrşidibe , û ew şîr hev digre û şeweyê wî jî şîr tîrîr û hişkîr e navê wî mast e .

7-Nîvişk : Dema hinek av tevî mast dibe dibe çeqil-mast lê dema ew av pirbe navê wî dewe ,dew di meşkê de tê keyandin û nîvişk bi ser dikeve ,ew nîvişk rûnê û pirotinê û ave , dema bixwazîna rûnê resen çêkin nîvişk bi tîna agir dipişêvîn û avê jê derdixin û rûnê resen bê av dimîne , nîvişk û rûnê resen zengînin bi vîtamînen A û K û D û E

8- çortan an(sûltan)an(kejk) :ava dew piştî nîvişkê jê digrin dikelin ew togê zer bi ser dikeve parzûn dîkin rojekê di teştêde dihêlin û xwê dîkin dîkin qursik û li ser tûmê xerûfê zîwa dîkin ta hişk dibe û tê hilandin di rojên çîle de hin xwarinan jê çêdîkin.

9-Ser û dew:Xwarinek ji ava çortan û girar(savar) û rûnê resen pêk tê.

10-Şîjik : Ava penêr berî kelandinê û kerengan pêk tê û dema kereng tinebin hin şînkayên di bi kar tînin.

11-Gulmast:Şîr û mast berdidin nav hev bi nanê xwarin.

12-Zer viçok: Penîrê nû ye sê rojî hê di parzûnê de ye kebanî dixe miqlîkê de û ava wî li ser agirekî hûr zîwa dike , ew penîr dibe wek lastîkê dema xwarina wê tine be zarokan pê razîdike.



Ezmûnên Xwendinê

(Li hemî bajarên Sûryayê tevgerêk çalak berî ezmûnan çêdibe, dibistanên xemilandin, kolanên bajaran ji hêla şaredariyan ve tene şuştin, li ser dîwar û tabloyan gotinê - ku xwendekarên kêfxweş û geşbîn dikin- tînen nîvîsandin, bi kurtayî mehrecana kêfê ye bê tîrs û bê pîrsgirêk....) xwezî ev rast ba.

Lê em ê vegeirî rastiyê, malbatên xwendekarên dipîrsin, em ê çave bihêlin zarîwên me bawer bibin ku divê bi keda xwe serkeftinê werbigrin? Çawe em bihêlin xwendekarên me li ser xwendinê aram bimînin?

Em ê li ser hin xalên girîng bisekinin, hewl bidin ji hin pîrsgirêkan berî ku bibin dîrkevin, ew hin şîret ji xwendekarên me û malbatên wan re ne:

- Geşbîn û bîrhatina serkeftinê qinyatya xwendekar bi kesayatiya wî û karînan wî geş dîke, berovajî wê tîrs, gef, reşbînî bawerîya wî kêmtîr dîkin, di encamê de karîna wî ya xwendinê, lêvegerîna û bibîrhatinê qels dibe.

- Dîrketin ji karên giran, birçûbûn û bêxewiyê, da ku mejî bi hesanî bi karê tîgîhiştinê û bibîranîna rabe.

- Sûdegirtin ji demê û dabeşkirina wê bi awayekî tîra waneyan bike, divê bêhnokên vehesanê jî hebin.

- Lêveger li minakên ezmûnên salên borî û parvekirina hevalan û mamosteyan di bersivdana wan de.

- Amadebûn û çûna navenda ezmûnê berî despêkê bi demekê baş, ji bo tîrs û lihevketinê çênebe.

- Xwendina pîrsê heta dawî, nabe xwendekar du peyvan ji pîrsê bixwîne û bîlez bersivê bide, ji ber ev sedemêke şaşbûnê ye.

- Piştî bidawîkirina bersivan, li wan vegere weke ku tu ji nû ve dinivise, li nemrên wan binere, li rêspellikan vegere bê te tu bersiv li wir jîbir nekîrine.

- Eger rewşeke tevlihev, pevçûn yan ku te di çavdêrên ezmûnê qeherîne, xwe nede xuyakirin û bi rûpela xwe mijûl be.

- Gava tu ji ezmûnê derketî gelekî nede pey ku hevalên te çî bersiv dane, ya kê rast e û ya kê şaş e, lê ya baş ku tu xwe amade bikî ji ezmûna bê re.

Li dawiyê, gotineke Ros Brot heye dibêje: (Gava ez timekê ava dikim, ez li kesine ku ji serkeftinê hes bikin digirim, eger min ew nedîtin, ez li kesina digirim ku ji tîkçûnê biqeherin), em tev xwe hin bikin ku em ji serkeftinê, geşbîniyê, pêşveçûnê hes bikin.

Zarokên Xwe Hînî Derewan Nekin



Belkî mirov ji ber vê navnîşanê bihiştî bimîne û bipîrse: ma gelo kes heye zarokên xwe hînî derewan bike? Lê diyar e ku dê û bav bi gelek awayan bê hemdî xwe zariwan bi ser vê kiryara nedurist de dehdî didin. Derew: gotinke ku beşek jê yan bi tevayî ne rast e, bi mebesta xapandinê ye ji bo wergirtina sodeyên diravî, derûnî, civakî. Hemî ol derewê gunehkarî dibînin, di piraniya civakan ji sinceke nebaş tê dîtin, eger derew bi kesekî re demeke dirêj ma, her ew derwîn bi pêş de çû bi afirandinê û awayên nû yê derewgotinê, wê çaxê ew dibe nexweşiyek bi xwediyê xwe re. Pîsporên derûna zarokan didin xuyan ku zarok piştî çarçapê salan dikarin derewan bikin û bihêlin yê dora wan bawer bikin, lê berî wê zarok di baweriyekê de ye ku dê û bav ramanan wî nas dîkin û nikare tîştêkî veşêre

yan ne rast bête û tê de berdeyam bike, ne ku bi rengê listok û henekyan yan jî ji bo tîrkirina pêdiviyên wî yê drûnî be. Ji bo dîrkirina zarokan ji derewan em ê hin çareyan diyar bikin: -Soza ku tu nikarî bi cih binî nede: gelek dê û bav soza diyarîyan, cilên nuh, listokan û xwarînan şêrîndî didin zaroka xwe, tevî ew ji despêkê ve zanin ku ew nikarin vê diyariyê binin, a ji vê baştir ew e ku tu bi bûneyên serkeftinê, rojbûnê û xelatdana ji ber karekî baş, diyariyêke bi rewşa te re lihevhatî be bineqîne û li gor wê soza xwe bidî. -Çî sedem hebin, ji zarokê nexwaze derewan bike: Eger hinek li te bipîrsin ji zarokan nexwaze bêjin: (ne li mal e), dema kardayîna xwe yê dibistanê pêk neyînin, ji wan nepejirîna sedemine nerast ji mamosteyên xwe re bêjin, derwaxekê Nîsanê jî wê xweş neke.

-Tîştên tu zanibe wê piştî demekê nas bike jê neveşêre: ji dêlva wê, diyarde û bûyer û kiryarên derdorê bi awayekî li gor temenê zarokê, jê re şîrove bike. - Wî nexwe quncîgeke teng de: nêzîkî zarokê be, zanibe êş û pîrsgirêkên wî çî ne, pê re arîkar be di çareseriyê de, rîya berpêkan jê re veke, ne ku her şaş bû tu êrîşî bikî. - Bi aramî ne bi tundî pê re bide û bistîne: eger şaşbû, ziyaneke yan derewekî kir, bi hêdî pê re li ser bisekine, bê tundî û lêdan, wî hîn bike vegeerê ji şaşiyê, ji dêlva derewê daxwaza lêborîna bike û lêborîna bipejirîne ji. eger ji şaşiyên xwe nevegeriya tu dikarî wî zaxa bikî bê lêdanê, wek qutkirina hin xelatên di demeke kin de, ew jî bêtîr ku tu derûna wî pir bêşîne. Li dawiyê gotina romanivêse brazilî Pawlo Kilo xweş şîret e, ji zarok û mezinan re, dibêje: (Gotina rastiyê û qehrandina xelkê, çêtir e ji derewan û razîkirina xelkê).



Desteya sernivîsê di Rojnameya Bûyepress de spasîyek germ ji bo çapxaneyaya SÎMAV li ser keda bêhempa ku di ber serkeftina kar de kirin pêşkêş dike



Li Bajarê Amedê Hunermend Aram Tigran Bi Bona 5 Salvegera Koca Wî Hate Birbîrxistin.



Hunermend Tigran hunermêde ku bi eslê xwe Eremnî ye, di nav gelê Kurd de xwedî cihekî teybet e û bi Bilbilê Rojhilata navîn tê nas kirin ji aliyê Navenda çandê ya Dicle-Firatê û Konservatuara ku li ser navê wî hate vekirin a bi navê Konservatuara Aram Tigran, li Tiyatroya Amfi ya li Qada Jiyane ya Sumerpark hat bibiranin. Merasimên biraninê bi xulekek rêzgirtinê dest pê kirin, li gor ku ANF'ê da xyua di biraninê de her yek ji serokê Dayireya çandê ya Şarederiya bajarê mezin a Amedê Muharrem Cebe û

endamê meclîsa KCD Îrfan Babaoglo axivîn, û di axaftinên xwe de dane xweyakin ku ew li ser dengê hunermend Aram Tigran mezin bûne, her wiha ji aliyekî ndin ve di nav axftinên xwe de êrişên bi ser gelê de ji aliyê rêxistina terorê DAIŞ ve şermezar kirin û ligel vê yekê jî rojnamevana şehîd Deniz Firat jî bibir xistin. Ji hunermendan hunermend Comerd beşdarî biranina hunermend Aram Tigran bû her wiha Koroya Dengê Mezopotamya jî bi stranên xwe beşdarî biranina hunermendê mezin Aram Tigran bû.

Jin û Mêrekî Fransî Bi Mebesta Li Dora Cihanê Bigerin, Ji Bajarê Wanê Derbasî Iranê Bûn.



Hevjînen ku li bajarê Parisê ya Fransayê dijîn Anna û Nicolas, hatin navçeya Qelqeliyê (Ozalp) ya Wanê. Li wê derê bersiva rojnamevana dan û diyar kirin ku rêwingiya wan baş derbas bûye û heta niha 4 hezar kîlometre rê piştî xwe hiştine. Anna û Nicolas, piştî danûstandinên Qelqeliyê berê xwe dane rêya Iranê û rêwingiya xwe domandin. Cotê fransî wê di dirêjîya salekê de dora cihanê biqedin. Welatên li ser rêya wan jî ew in: Îran, Tirkmenistan, Ozbekistan, Tacikistan, Çîn, V e t n a m , Kamboçya, Tayland û Hong Kong. Dora biskletê 5 mehan berê ji Îtalya dest pê kiribû. Anna û Nicolas, di Almaniya, Makedonya û paşê ser Yewnanistanê re derbas bûbûn.



Kurdî Xweş e

Fêrname شهادة
Pol صفت
Dop لوح
Pênûs قلم
Lênûs دفتر
Rênûs اىلاء

Pile درجه
Wane نرس
Lêkolîn بحث
Ximav خبر
Kedan طباىشر
Fêrker مەخەم

Mamik ???

- Kaxiz e çîzewiz, çû bajarê evdileziz, tîne kêfa xort û qîz?
 - Ezmanê darîn e, berfê dibarinê?
 - Tizbî ya kalê, berê xwe da palê?
 - Gayê kejo, li hewa dajoy?
 - Çiyayê bê kevir, derya ya bê av, daristana bê dar, bajarê bê mirov?
- Qesra sipî bêderî: Hêk e. Bi şev bûk e, biroj pepûk e.**

محطة محروقات
ميديا
GAZIYA MÎDIYA
Salih Giştî
صالح كشتي
قامشلي . الشارع العام . مقابل الجمارك 450076

Pend

Aqilê sivik barekî giran e.
Deveh birin ba nalbenda, Keran lingên xwe hildan.
Aşê nezanan ji ber xwe ve digere.
Ne dar e û ne bizmar e.
Ne av pê sar dibe û ne pê germ dibe.
Weke simaqa şîştî ye.
Aqil zêrîn e, di serê herkesî de nîn e.
Dê û weledan şer kir, bê aqilan bawer kir.
- Derziya di çavê yê din de dibîne, şûjîna di çavê xwe de nabîne.

Zûbêj

Tu dikarî sê caran, zû li ser hev bêjî:
(Heft Baq Dezî Di Derziya Terzi De Bezîn).

XAÇERÊZ

- ASOYÎ:**
- 1- Paşnavê nivêsk-arekîkurd bi Erebi dini-vîse.
 - 2- Xweda li ba Zeredêşt, wekhev.
 - 3- Şêwe.
 - 4- Daçek (vajî), tîpên-dengdêr yên kin.
 - 5- Kovareke Celadet (vajî), wekhev.
 - 6- wekhev.
 - 7- Avjenî (bi lêvkirineke din), wekhev.
 - 8- Bajarekî bi Qamişlove ye.

- STÛNÎ:**
- 1- Paşnavê mir Celadet.
 - 2- Kîtej ji Ehreman, ji bo, daçek.
 - 3- Nivê Newroz, jibo demborandinê.
 - 4- Paşdaçek (vajî), dijêrê, wekhev.
 - 5- Kar û westan.
 - 6- Wekhev.
 - 7- Cihê tariyê.
 - 8- Pirtûka Zeredêşt.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								

Hejmara Bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	c	e	g	e	r	x	w	i	n	
2	i	n	g	l	î	z	î	l	k	
3	z	a		e	m	ê		ê	r	e
4	l	z	e	k		m	ê	r	l	k
5	r		o	t	î	n	e	m	a	
6	a	r		r	r	n	v	b		
7	b	o	r	l		a	a	ê	ş	
8	o	n	i	k	o	r	a	z		e
9	t	î	t		l	a		e	m	r
10	a			v	î	z		r	l	m